Ya girîngtir jî ev bû ku gotiye: "... Me rojekê hevalekî xwe mirand û xîste nav kefen. Ji çolê li ser darbestê me anî gund û me xwe digiriyand. Jin û mêr bi me re digiriyand. Li mizgeftê me jî gundî, axa û serkaran re got: "Eger win sed ripî bidin me, ez ê wî rakim." Piştê pere wergirtiye û weke Îsa Pêxember ew rakiriye jîyanê. Gelo meriv dikare bi vê yekê çî navî lê bike?

Bila vêce xelk bi wijdan biryara xwe li serê bide.

Te gotiye ev nasnavê Ceger + Xwîn jê re ne rewa bû. Li gor te nasavê guncav û munasib jê re çî ye?

Gerek e jê re Şêxmûsê Komonîst (Şûî) bihata gotin.

Wateya navê "Cegerxwîn" pir mezin e, anku hingî eş û janên miletê xwe kişandine, cegera wî bûye xwîn. Lê dema ku tu neyartiya hemî rêxistin û şoreşên Neteweyê Kurd bikî, ne cegerxwîntî ye lê dijminatî ye.

Te di PIRSNAMÊYA xwe de bang li "DADGEHA BALAYA KURDISTANÊ" kiriye ku Cegerxwîn dadgeh bikin. Tu dixwazî çî ceza der heqê Cegerxwîn de were dayîn?

Eger rojekê dadgeheke bala li Kurdistanê hate avakirin, divê ew dadgeh li ser daxwaznameya min doz li Cegerxwînî veke û ji ber kiryarên wî eger ceza çî be, bidê.

Her wiha ew mirovên ku Cegerxwînî ew xayîn, mêrkuj, diz, talanker, tolaz û xirab bi nav kirine, divê Dadgeha Bala rûmet û îtbara wan li wan vegeirîne. Eger Dadgeh biryareke wisan werne-gire, tê wateya nebûkariyên ku Cegerxwîn kirine raşt in. Li dunyayê tenê du milet hene ku qanûna wan nehatiye nivîsandin, yek jê miletê Kurd e û yek jî Ingilîz e.

Ingilîz jî mîna Kurdan li gor toreyaya xwe tev digerin. Civata wan a rîsipiyân heye û dema ku kesek sûcdar hebe, ew civata rîsipiyân der heqê wî de hukim dibire. Îcar di Toreya Kurdî de, ev insanên ku Cegerxwîn ew xayîn bi nav kirine, ew insan tev bûne wijdana Neteweya Kurd û eger tu heqaretê li wan mirovan bikî, tu heqaretê li temamê Kurdan dikî. Di pirtûka Cegerxwînî de rêberên hemî şoreşên Kurdan xayîn in. Cegerxwîn gotiye, Şêx Se'îd û hevalên xwe jinên Kurdan direvandin û morikên qirika wan diqetandin!

Ez ê tiştêkî pir balkêş bibêjim: Serokê Dadgeha Îstîqlalê ku li Diyarbekrê fermana bidarvekirina 460 Kurdî daye, Cegerxwîn jê re gotiye FERMANREWA! Anku biryarên ku dide tev rewa û cayiz in.

De baş e, îcar kurdekî ku cegera xwe kiriye xwîn, dikar ji hakimekî ku fermana bidarvekirina hewqas Kurd daye re bibêje feramnrewa?

Bila xelk baş zanibe ku Cegerxwîn ne "cegerxwîn" bû, ne kurderewer bû, lê xirabiya herî mezin li şoreşgêr, rêxistin û serhildanên Neteweyê Kurd kiriye.

Ji ber çî PIRSNAMÊYA te 15 salan dereng ma, û te niha da capê?

Dema ku min pirtûka xwe di 2002'an de bi dawî kir, piraniya Kurdên siyasi komonîst bûn. Vêce wê hingê Kurdan Cegerxwîn wekî qehremanekî neteweyî bê şert û merc qebûl dikir. Min dizanibû ku ew rewş pir nadomîne, ji ber ku îdolojiyên batil zû tene guhertin.

Min pirtûka xwe hişt heta vê demê, ji ber ku ew dewletên ku Cegerxwîn ji wan re digot Imperyalîst û komonîst, tev bi hev re niha deşt bi alikariya bi Kurdan re kirine. Vêce min got ku dem hatiye da ez pirtûka xwe biweşînim.

Berhema Cegerxwîn a bi navê "Jînenîgariya Min" ta çî astê tu jê piştêstî î ku pê nehatiye guhertin an lêzêdekirin?

Na, na! Lê nehatiye zêdekirin, lê belê pir tişt jê hatine kêmkirin.

Du mamoştayên Kurd ku wan her duyan destnivîsa pirtûka Cegerxwîn li çapxaneyê deqandine û sereraşt kirine, min bi wan her duyan re jî xeber daye. Yekî ji wan jî min re got: "Welehî hin nivîsên Cegerxwîn hebûn dilê meriv jê dixeliya, vêce me ew jê derxistin." Aniha jî ew destxet li weşanxaneyê di dosyayê de tene paraştin.

Gelo Cegerxwîn renekî nû û spehî li tûrikê wêjeya Kurdî û li gewdê helbesta Kurdî bar nekiriye?

Na, Cegerxwîn kitêbek li ser Folklorê Kurdî nivîsandiye, tiştên pir ecêb û xirab tê de nivîsandine.

Cegerxwîn di nivîsandina pirtûkan de pir nezan bûye. Uslûb û şewazê nivîsandina kitêban nedizanî.


Nivîsên Cegerxwîn ji aliye rêzimanî ve 80% şaş in. Di pirtûka Jînenîgariya Min" de du helbestên Melayê Cizîrî nivîsandine, her du jî şaş nivîsîne. Eger ku Cegerxwîn merivekî zana bûna, helbesta Melayê Cizîrê şaş nedivîsand.

Te zêdetir ji carekê gotiye û nivîsiye ku 5000 peyvên Kurdî di Qur'anê de hene, eger tu hinekî babetê rave bikî û mînakine zindî bidî?

Gelekan ev pirs jî min pirsîye. Di Qur'anê de ayetek heye dibêje "

"We ma erselna min resûlîn illa bi lisanî qewmihî lî yûbeyyîne lehum..." Ayet: 4, sûret: İBRAHÎM.

Bê guman me pêxember nehî-nartiye îla bi zimanê wî qewmî,



da ji wan re beyan bike.

Ayeteke din jî weha ye:

"We min ayatihî xelqû ssemawati wel erdî we itilafu elsinetikum we elwanikûm." Sûret Rûm, Ayet: 22.

(Ziman û çanda hemû mexlûqatên erd û asîman, her yekê ayetek ji ayetên min in.)

Bi wan Ayetan diyar bû ku pêxember ji Kurdan jî rabûne û zimanê Kurdî jî Ayetek ji ayetên Xwedê ye.

Niha li navçeya Gêlê ya Amedê, gora neh pêxemberan heye.

Ya balkêştir ev e: Her kes dibêje, kilîda Quranê "Bismi lahî rrehmanî rrehîm" e. Binerin daçeka "Bi"yê ji Çanda Kurdî (hindo-îrani) hatiye wergirtin. Di zimanê Erebi de peyveke wek "bi" ku wateya "me"yê bide tune.


Ereb dibêjin Quran tev Erebi ye, ev gotin nebûkarî ye. Ji peyvên kurdî zêdetir heta gotinên Yûnanî jî di Quranê de hene.

Wêjeya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê gihaye çî astê?

Wêjeya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê pir lawaz e.

Sedem jî ev e:

Vêga li Bakûr kurdên ku bi zimanê "Turkmancî" dipeyivin



hene, li Rojava jî Erebmancî xeber didin.

Çend nivîskarên kevin hene ew baş in, wekî: Dilawerê Zengî, Konê Reş û çend kesên wisa...

Çî li Bakûr be, çî jî li Rojava be Zimanê Kurdî di heman rewşê de ye.

Mixabin xelkê me biyaniyê çanda xwe ye, eger xelkê me zana

bûya, dê rewş ne ev rewş bûya.

Der barê şer û guhertinên ku aniha li Rojavayê Kurdistanê dibin, hûn çî dibêjin?

Keko ev şerê nuha pir normal e. Di 1923'yan de Sovyet pir xurt bû, wê hingê cihanê jî tirsra Yekîtiya Sovyetan re doza gelan êxistin binê maseyê.

Dema ku di 1991'ê de Sovyet têk çû, hingê eşkera bû ku hemî milet dê bigihin mafên xwe û li Danîmarkê biryar pê hate dayin ku hemî miletên cihanê bigihin heqê xwe.

Vê gavê welatên Rojavayê deşt avêtine Doza Kurdî. Rûs û Emerîka di meseleya Kurdistanê de bûne hevkar.

Eger rêxistinên Kurdan ji hev re baş bin, dê zû rewşa xwe çareser bikin.

Ev miletê bi navê Kurd, tarîxa wî pir kevn e û gelek dewlet çekirine. Êdî wijdana dunyayê hew semax dike ku ev karasetên mezin bêne serê Kurdan.

Gotina Dawî...

Ez û te bi zimanekî bi hev re diaxivin, bi zimanê Kurdî.

Tiştê ku min û te bi hev du ve girêdide ev ziman e, ne tiştêkî din e.

Eger ziman, kultûr û Kurdewarî di navbera me de hebe em dikarin her tiştî bikin lê ku tune be, em nikarin çar gavan bi hev re bavêjin.

Eger leşkerên te bi milyonan hebin, dikarin bibin tune; lê ku zimanê te hebe tu kes nikare te tune bike.

Ev zimanê me bi saya 4 saziyan hatiye paraştin: Yek medreseya Kurdî bû. Ya duyan Tekya Şêxan bû. Yek jî dîwana axayan bû û ya din jî dengbêj û sitranbêjên me bûn ku min navê "Dibîstana Zindî" li wan kiriye.

Her çî qas şêx xirabî dikirin jî, lê Kurdewar bû.

Axa çî qasî ku zalim bûn jî, lê ew jî Kurdewar bû.

Ziman ruhê netewî ye, eger me terka vî zimanî kir dê ruhê me jî biçê.

Pir girîng e ku her bavek, her dêyek bi zarokên xwe re bi Zimanê Kurdî bipeyive.

Spas ji bo vê hevpeyvîna ku te bi min re li ser van babetên girîng kir.



peyveke tenê jî li serê nenivîsiye!

Cegerxwîn dijminatîya şêx û axayan kiriye, lê dema ku Haco Axa du gund dane wî, Cegerxwîn gundek firotiye û pê bazirganiya genim kiriye, û li gundê din jî axatî kiriye. Tivink daye deştên xwe û çend peya li dora xwe kom kirine û gotiye: "... Min tanî ber çavên xwe ko em çend mêrên Mala Elo hene, şevêkê yan carekê bi hev re bikujin" Ma însanê welatparêz, teşebusa kuştina kurdên gundî dike? Ne mumkin e ku bike!

Tiştêkî pir balkêş heye, li gundê Cegerxwînî keçek nîşan kirine, lê piştê keçik bi nîşaneyê xwe razî nebûye û keç hatiye kuştin. Cegerxwîn di bîranînên xwe de gelek rûpel li ser serpêhatiya wê keçê nivîsiye; lê Cegerxwîn tenê bi rûpelekê behsa Komara Kurdistan a Mehabadê kiriye, ew jî bi xerabî...

Dibe ku rexnevan bibêjin ji ber ku Zeynelabidin Zinar mirovekî oldar e, dijayetiya Cegerxwînî dike..?

Ev pirs te, berî çend rojan ji Duhokê jî, ji min re hat.

Diyar e ku baweriya min bi Dînê Îslamê heye, baweriya min bi Muhemed heye û baweriya min bi Xwedê heye, lê baweriya min bi Doza Neteweya Kurd jî heye

Karê Hevbeş... Aşteng û Pirsgirêk

Ji despêkê de, di xwezaya xwe de mirov li hev dicivin, bi hev re karan dikin da ku xwe ji metirsiyan biparêzin, çî serma, bahoz û baranan be, çî li hember cinawerên hovane yên jiyana mirovan dikin bin gefa xwe de, be; Bi hev re neçir dikirin, şikeftên xwe tekûz dikirin û li hemberî bobelatên xwezayê radiwestiyan....

Ev dîroka dîr û dirêj, ji qonaxa neçîrê, kedikirina cinaweran, şivantî, çandinî her wiha qonaxên din ta îro roj, ev şaristaniya ku mirovayeti gihayê, bêt guman ji encamê karê hevbeş yê di navbera mirovan de ye.

Karê hevbeş, bihtir ji karê kes, komele, partî û sazîyekê ye, ev rengê kar, hewcedarî kes, partî, millet û dewletan e, bo bicikirina armancên hevbeş di navbera tevan de; armanc bi xwe jî dibe ku demkî be an stratecîk be, bo guhertina jîwerê ku tê de dijîn, bal bi xweşî, şahî û kameraniyê ve. Di dîroka tevgera Kurdî de li Rojavayê Kurdistanê, mînakine berçav û balkêş ji alavên karê hevbeş hene, di qonaxa giring de hatin damezrandin, çî demkî bin an jî qonaxane bin, tim jî yekrêziya kurdî encamine hêja û bi nîrx anîne holê weke: Hevbendiya Dimokrat a Kurd li Sûriyê ya li sala 1986'an hatibû avakirin, Diwem, Partiyên tevgera kurdî bi hev re, karibûn di sala 1990'î de derbasî hilbijartinên perlemana Sûryê bibin û di encamê de sê berbijêrên xwe bigihînin perlemanê....

Ji hêla din ve, di sala 1991'ê de, piştigiriya serhildana Kurdistanê başûr kirin, ji milletê kurd li rojavayê Kurdistanê, alikariyên diravî, cil û xwarin civandin û ji wan re rêkiran....

Mînaka sêyem encûmena (Te-vaya Partiyên tevgera Kurdî) bû, di serhildana Qamişlo sala 2004'ê de, karibû serkêşiyê bike û alikariyê bi malbatên pakrewan û birîndaran re bike.

Çarem, di şoreşa Sûriyê de Encumena Niştimaniya Kurdî hate damezrandin û bi Encumena Gel a Rojavayê Kurdistanê re Desteya Kurdî ya Bilind damezrand û di rêkefta Dihokê de jî Lêvegera Siyasî ya Kurdî hate avakirin. Bê guman, ew gavine balkêş û rewa bûn bo xizmeta doza gelê Kurd, lê mixabin berdewam nekirin û rawestiyân, hêviyên ku millet li ser wan girêdîdan, bi sedemine ne rewa li ber bayê çûn, di serê wan de ezêziya partiyân bû.


Eger, em xwendineke zaniştî û siyasî, lê bikin, bi gelemperî em dikarin di hundurê çend xalên sereke de van sedeman bidin xuyanîkirin:

1- Bikaranîna çanda karênekane û berberiyê jî dêvlar karê tevahî û mil li mil... Her aliyek nemaze yê xurt- dixwaze bîr û boçûnê xwe bibe serî, da bikeve xizmeta berjewendiyên wî yên kesane, an jî yê partiyane de .

2- Peydanebûna rêveberiyêkê lêhatî û çalak, da kar û xebatê di ber armancên vî karê hevbeş de bike, ev xal bi xwe cihê metirsiyê mezîn e, dema ku ev rêveberî lerz û siîst be, tu carî hêvî li ser nayên girêdan, û wê tu qezincan jî bi dest nexe.

3- Hêz û şiyânê heyî naxin cihê xwe yê lêhatî de, da bikeve xizmeta armancên karê wan, endamînin jî wê komîtê dimînin bê kar , di encamê de serêş û aştengan di pêşiya hevkarên xwe û karê hevbeş de, çêdikin.

4- Gelek caran, jîmara komîta rêveberî bihtir e ji ku tê xwestin, dibe ku ji her aliyekî endamek



Nûşîn Bêcirmanî

be, wilo pîlan di bin masan de tîn hûnandin, tenê mebeşt ku kesê çalak û jîr di wê komîtê de jî cihê biryarê dîr bikin, em gelek mînanan jî dizanin û me ditîne.

5- Peywendiyên di navbera komîtê bi xwe de, qels in, û di asta herî kême de ne, ji ber wê jî, nabin yek dest û yek dil li hember bicikirina hêviyên millet, lê berîvayî wê, û ji bo rehên berberiyê xwe berdin xwar, pîlanê dihînin, di encamê de kar li bin guhê hev bikeve.

6- Destêwerdan û pîlanê derve, da ku van aliyên berdîna pîsêra hev, çî bi piştigiriya siyasî an jî ya diravî; bêbaweriyê di navbera wan de biçînin, da qels bibin, û tim hewcedarî Karê Hevbeş ...Dûmahîka wan bin, an li gor berjewendiyên wan hêzên derve bin .

Bê guman sedemine din jî hene, lê ev yên sereke bûn....

Ne veşartî ye ku ev sedemên jorîn, hemû li bejna karê hevbeş yê tevgera kurdî li Rojavayê Kurdistanê tîn!... Gelê kurd bi gelemperî û bi taybetî tevgera wî ya siyasî, hewcedarî çanda karê hevbeş e, ew karê ku pêwîst e liv di ber armancên wî de bibin - di encamê de- ew armanc û hêvî wê yên gelê Kurd bin.....

Encûmena Reqayê ya Sivîl... Nimûneyeke Serkeftî li Bakurê Sûryayê ye

Çî dema ku Hêzên Sûryaya Demokratîk di şerê xwe de li hember çekdarên Rêxisitna DA'ÎŞ'ê bajarek kontrol dikir, li gel karê leşkerî karekî sivîl jî dihatê kirin, çî jî aliyê bijîşkî an hawarçûnê ve be, an jî damezirandina encumen û desteyên sivîl ku rewşa wan bajaran bi rê ve dibirin be.

Mînaka li ser vê yekê jî encumenên Girê Spî û Minbicê, û karê dema dawî li Tebqayê ye. Lê dibe ku mijara rizgarkirina Reqayê jî çekdarên DA'ÎŞ'ê re mijareke cîyawaz be, çîmkî ew payexta "Xilafeta" dewleta DA'ÎŞ'ê ye, û pir aliyên xwestin ku para wan di bajêr û operasyonên rizgarkirina wê de hebe.

Li bajarê Eyn Îsâyê yê gundewarê Reqayê, Encumena Reqayê ya Sivîl ji hejmareke kesayetiyan navdar û xwedî giranî di nava civaka deverê de hate damezrandin; mîna her car şepêleke nerazîbûn û dijberiya vê encumênekê çêbû, nexasim di nav refên Rikberiya Sûri ya li Turkyayê û derveyî Sûryê de, digotin ku ev encumen nûnertiya pêkhatiyên Reqayê nake, ew jî aliyê Hêzên Sûryaya Demokratîk ve hatiye danîn û îdyolojiyêkê taybet dimeşîne, her wiha hikûmeta Demkî ya ser bi Rikberiya Sûri ve li Rihaya bakurê Kurdistanê encumenek li hember Encumena hundir ragihand.

Ev hewldanên Rikeriyê bi armanca dîrxîstina Encûmena hundir bûn, lê tiştê cîyawazî di vê qunaxê de, ku vê carê Emerîkayê

piştigiriya xwe bi awayekî eşkere bo Encumena hundir ragihand, û bi taybet dema ku Nûnerê Serokê Emerîkî "Donald Trump" bo Hevpeymana Navneteweyî ya Dijî DA'ÎŞ'ê "Bêrt Makirgog" seredana deverê kir û li gel serkêşiya Encumênê civiya, piştigiriya welatê xwe bo wê ragihand; vê yekê bersivdayîneke redkirin û nerazîbûnê li cem Rikberiyê û hêzên piştigiriya wê dikin çekir, û fişar li Emerîkayê bû da ku ji biryara xwe vegere. Lê tiştê di her du hefteyên bûrî de çêbû, dema ku şandeyêkê fermî jî Wezaretê Karê Derve ya Emerîkî bi awayekî yekser berê xwe da Rojava û çû gundewarê Reqayê da ku bi Encumena Reqayê re bicive, û şûn ve berhemên civînê ragihandin, û li ser baweriyê Emerîka bi Encumena Reqayê ya Sivîl tekez kir, ew yek wateya wê ew e ku vê carê dê rêvebiriya Reqayê di destên Encumena wê ya Sivîl de be, ku ew jî kesên li hundirê welat mane pêk tê, û Emerîka çend caran li ser vê yekê tekez kir, ku ew ê pala kesên li hundirê welat dijîn bigire, çîmkî ew rewşa civakê bêhtir nas dikin.

Tekez dê hêzên ku dijberiya HSD'ê dikin ne razî bin, lê ya dinî tekezbiyê ku Emerîka jî awayê karê xwe li Sûryayê guherîye, û êdî Emerîka piştî Trump ne mîna Emerîka berî wî be, û dê siyaseta wê hişkîr be, û vegeer jî briyaran çênabe.

Eger mirov xweşik movikên mijarê sîrove bike, dê bighêje raştiyekê ku kar û xebata sivîl li



Baz Elî Begarî

Rojava û bakurê Sûryê girîngiya wê ne kêmi kar û xebata leşkerî ye, û divê karekî raşt bo vê yekê bibe, da ku nimûneya Reqayê bibe nimûneyeke Sûri û civaka Rojava û bakurê Sûryê li ser dora xwe bêhtir vebe.

Her wiha berpirsariya Rêveberiya Xweser jî girantir kir, ku ew êdî berê xwe bêhtir bide civakê, kirzên politik li deverên jêr kontrola xwe çareser bike, û rêjeya pînpêkirinê mafên mirovan jî kême bibe, da bighêje asteke ku ew bînpêkirin nemînin, û hemî desteyên wê çalak bibin, û derî ji hevpariya politik a raşteqîn bi hemî hêzan re veke, û ew xwe nebîne himberê jî van hêzan re, da ku deriyê azadiya nerîn, kar û çalakiyên politik bêhtir vebe.

Ezmûna Encumena Reqayê divê Rêveberî sudeyê jê bigire û destê xwe bo hemî hêzan di hundirê Rojava de jî dirêj bike, çîmkî di dema niha de devera herî pişt pê tê girêdan ku bibe bingehek bo Sûryaya siberojê ew Rojava ye, ku tevî hemî kêmasiyan li hember deverên din li Sûryê bêhtir amade ye, û nimûneyeke pêşkêfî jî rêveberiya deveran re ye.

Rojava û Çavdêriya Hemiyân

Xuya dike ku hemî aliyan şer di Sûryayê de bawer in ku çareserî bo armancan û bidawînan kirizê tenê raman û şeweya firehkirina şer û pevçûnan e, da ku hin bi ser kevin û hinê din jî bişikîn.

Bi tenê li Rojavayê Kurdistanê Kurd bervedêr in û di heman demê de xwedanê biryara mayîna dewleta Sûri di mercên demografî de ne, her wiha pêkanîna mafê gelê Kurd li ser erdnigariya Kurdistanê ya girêdayî dewleta Sûri di mercên li hevkiirineke siyasî û rêkeftineke destûrî de.

Lî ser van bîr û baweriyên, jî rojên pêşî de Kurd tevî Şoreşa Sûri bûn çaxê hemî kes daketin kolanan , deng ji bona rumet û azadiyê hildidan û pîrsa mezîn ta anîha ew e ku dê Sûri di paşeroja xwe de bi çî tewerê bête birêvebirin?

Heger em li rûbera şer û pêkdadanan meyme bikin û hewla şirovedayîne bidin, em ê bibînin ku gelek alî û hêzên herêmê û yên sereke ku xwedî bandor in di siyaseta navnetewî de, tevî gêra perçandî û kuştinê di Sûri de bûne. Her yek jî wan bi serê tayekî girtiyê û di serê din de jî heman tayî alaveke kelepekîrî heye girêdaye , li gor xwesteka xwe dilebitîne , û dibe cihê mixabiniyê ku ew alava girêdayî bi dawiya ta ve bi xwe Sûri ye hatiye kirin û firotin da ku welatê xwe biherifîne , perçe bike.

Lî ser van nîrxandinan em dikarin bêjin ku Rêjîma Sûri û hevalbendên wê li ser pîlan û pîvanine zîz û hişyardayî kar û barên xwe bi rê ve birin, da ku navê şoreşê jî ser bûyeran hilîne, bide xuyanîkirin qaşo tiştê çêbide mîlmilandineke tîreyî û mezhebî ye; ne daxwaza azadî û guhertinê ye, lewma sînor hatin vekirin da ku rêxistinên terorîst û Islamiyên tundrew derbasî nava welat bibin û di encamê de milletê Sûri hat êşandin û bi ser Koçberiyê de hat dehdîdan ta radeya guhertîna demografî ,valakirina bajar û gundan, li ber çavên tevan e, gel

û dewletên dunyayê bêyî ku heşt berpirsariya kesî bilive da ku bêjin na.

Di van galgal û delîvayan de doza Kurd wekî çawa ji dema sed salî ve amade ye, hatiye binçavkirin û di bin hewlên gelê Kurd û tevgera wî ya siyasî de xwe davêje rojava bûyeran, jî ber ku di rûbera qada welatê Sûri ya siyasî de dema doza çareseriyê siyasî tê guftûgokirin mijara çarenûsa gelê Kurd dikeve beramberî hemiyân, mijareke neteweyî û raştiyêke dîrokî ye, heger lî ser bîngêhên saxlem, raşteqînê û aştiyane neyê bicînan; wê nexşeya Sûryê hemî nebe.

Lî vê derê û berovajî hemî hêvî û pêşbîniyên jî hêla Kurdan ve, me dit ku piraniya aliyan Rikberiya Sûri xwedî giravî jî qewmciyan ta lîbrâl û radikalan, heyani qaşo dimoqratan di dijayetiya mafê gelê Kurd de bûne hevparê lîxwan û Be'siyan, û berê hêzên xwe yî leşkerî dane bajarên Kurdan û jî Serê Kanîyê pîlan dest pê kir, ew jî di bin çavdêrî û palpiştiya dijminê Kurda de , di serî Dewleta Tirk bi mebešta rêgirtinê li pêşiya ku Kurd tu maf û qezencan wernegirin , nemaze çaxê ku Kurdan li berxwedan û êrişê hatin şikandin mixabin ew êrişên bi navê Artêşa Azad ku cihê omîda guhertinê di destpêka Şoreşa gelê Suryê de bû, û bi vî hawî tirazî û tîgîh hatin guhertin û di heman demê de mebeşt û armanc jî hatin zelalkirin, bi teybtî gava hêzên Kurdî bi YPG û YPJ pêş ketin , serkeftin bi dest xiştin û coxrafiya di bin destê xwe de fireh kirin û bûn hevparê hevalbendên bereya şerê dijî terorê, nemaze Emerîka û hevkarîya di navbera wan û Kurdan de.

Di şerê ku her roj di rûyê DA'ÎŞ'ê de tê birêvebirin, çek û teqemeniyên ku jî hêzên Kurdî re hat diyarkirin, çî li Rojava û çî li Başûrê Kurdistanê ev tîkîlî û rêkeftinên ku hatin girêdan heger were xuyakirin ku demkî ne, diyar e jî bo hemî aliyên çî Kurd û çî Emerîkî bin, dibe



Zahid Mehmûd Xelef

ku nerîneke îstratecîk di hundirê xwe de vedihewîne û di vî warî de ez ne bawer im ku hêzeke weke Emerîka bi hemî pêkarîneke xwe ve derbasî Sûryê bibe ,cihê xwe di herêmên Kurdan de çêbibe ,balefirgehên leşkerî û baregehên ava bike û di dawî de pišta xwe bide herêmê , ev ne tiştêkî jîwerî ye jî ber gelek sedeman yek jî wan, girîngiya heremî ya ekonomî, petrol û xaza surîştî, ya din ew e ku herêma kirîzê dikeve kêleka Îsrayîl û Kendava Erebi, her wiha çawanîya bikaranîna mijarê weke zext û mertal di rûyê Îranê de. Sedema din ew e ku milletê Kurd êdî nema dagirkeriyê dipejirîne û dikare hinek pelik û alava bi dest bibe, bi wateya ku her kes gihaye baweriyê ku Kurd wê bibin dewlet û pêşbîn dibe ku ev dewlet dimoqratî, xwedî rol û bandor be di hevteraziya Rojhilata Navîn de, jî hêla din ve coxrafiya herêmên Kurdî di girîngiya wan di nexşeyên leşkerî de ,nexasim liv û tevgera Rûsya û Îran di hêla leşkerî de û hewldanên wan da ku dest deynin ser hemî tiştî û weke xwe çareseriyê binivîsin bo berjewendiyên xwe, lewma em dikarin bibêjin ku şerê li rojava diqewime tîrsa xwe êxiştîye hinavê hemî aliyan neyar jî Kurdan re û gomana wan ew e ku ezmûna herêma Kurdistanê Başûr dîbare bibe.

Ziman, Huner û Felsefe

Felsefe çî ye?

Di dîroka mirovahiyê de Felsefe, hezkirina jî zanebûnê û di heman demê de navê hunera fêrbûnê ye. Cudahiya di navbera ajal û mirovî de, destpêka felsefeyê ye. Felsefe bi fikirandinê re ketiye jiyana mirov û tiştê mirov û ajal jî hev cuda kiriyê jî felsefe ye. Ji bo ku kesayeti jî zanebûnê hez bike, pêdivî bi fikirandinê heye. Fikirandin destpêka afirandinê ye.

Kesên ku di şibakeya felsefeyê de li mijar û bûyeran binihêre, bi mantiq nêzikî mijar û bûyeran dibe, kesên ku di felsefeyê de tîgîhiştî nebin jî, bi keleşanê reaksiyon nişanî bûyer û mijaran didin. Loma jî; jî bo jiyaneke maqûl û pêşeroja mirovahiyê, pêdiviya mirov bi felsefeyê heye.

Huner û Felsefe

Di Felsefeyê de, tiştê herî sereke ziman e. Ez dixwazim balê bîkşînim ser ziman û hunera kurdî. Û dîsa, ez ê jî Umer Xeyam, jî Nietzsche û jî dengbêjiya kurdî hinek mînanan bibim û li ser mijara ziman, huner û girêdana wan a bi felsefeyê re rawestim. Serkeftina Xeyam a afirandina hunera wî, di heman demê de, ya di warê zimanê wî de jî, xwe rave dîke û bi qasî hunera wî, zimanê wî jî serkeftî bûye.

Mînak:

‘Xweş qedeh e, aqil jê re li çepîkan dide
Radimûse û bi sedan maç li


rûyan dide

Ax jî destê cerçêkerê ku bi ked û xebat;
Wan çêdike û dîsa radîke û li erdê dide’
Umer Xeyam di çarînen xwe de; serkeftina xwe ya ziman jî, bi qasî hunera xwe li ber çavên mirov radixe. Em çawa zimên wekî amûra di navbera felsefe û hunerê de dibînin, Nietzsche jî, çakûçê destê pêykêvan, wekî amûra navbera huner û felsefeyê bi nav dîke.

Dîsa Dengbêj Şakiro û gelek dengbêjên kurd, di kilamên xwe de serkeftina xwe ya di warê ziman de, wekî Umer Xeyam li ber çavan radixin û di kilamên xwe de zimên orgazm dikin û wekî hespeke kihêl radikin çar nalan û dibezînin. Di navbera dengbêjiya kurdî û hunermandiya kurdî ya modern de, bi qasî çiya û baniyan cudahiyeke jî hev dîr heye û ev jî mînaka ku me li jor dabû û rûmeta ziman a di navbera hûner û felsefeyê de sereraşt dîke û hêzdartir dîke.

Mînak:

‘Tu nizanî ez Xezal im,
xezala Egîd im,
gerdena min zer e,
çepilên min dirêj e,
porê min kej e,
nava min qendil e,
zenda min bi bazin e,
tiliya min bi gûstîl e,
lêva min tenik e,
pozê min bi qerefil e,
si û sê gulî li ser bejna min a te-



Xakî Bîngol

nîk û zirav bûne çit e.
Dêrisê gundê me de bişt û çar eşîr in,
loooco loo yooo lo Sekvano,
tu nizanî sev xatirê çav û birûyên min,
yên reş û belek ketine dawê,
ocax koro bişt û çar serî sekva-noooooo...

Egîdo sibehe tu nizanî sev xatirê çav û birûyên min, yên reş û belek ketine dewê,
heywax li minê, bişt û çar serî, de looooo lo sekvano, biçûko, xeşîmo, nezano lo nijdevano’

Hunera jî Felsefeyê dîr!

Bişaftina li ser zimanê kurdî û jiyana hunermandên Kurd, ên vê dema em tê de dijîn, ku bi zimanê serdestan rojane dijîn û qaşo ‘hunera’ Kurdî diafirînin, dişibe Hespê bê Zîn û Zengî, bê Hevsar û Gem, bê Teng û Bêleme. Ev tişt jî, nişana hunera bêfelsefe ye. Ez sebebê wê hunera bêfelsefe, wekî dîrbûna jî ziman bi nav dikim. ‘Tişt hene, bi qasî tiştên, di hundirê tiştan de.’

Helbestine Bijartî...Elî Roj

Rêwî

Li benda min nema
 Ji beriya min xatir xwest
 Nameyek ji girmijîna wênayê
 xwe hiştibû
 Berî kû çerxa felekê
 Bibe serdestê jînê
 Firmêskên ji henaseya
 şunwaran
 Parçe dikir bédengiya heştên
 xweser
 Careke din dem dibûne neyarên
 vê rojê
 Şûna her axînekî jan dida
 Sehkirina dengê te
 Kêlî bi kêlî ez bi xwe re dibî-
 rim
 Nava bîrhatinên bê navnîşan
 Sêwî dihiştin gulên bexçeyê
 gotinan
 Ezmanên çaxê pêşwaziya
 kerwanan
 Li ber xwe dikir
 Pirwaza axa dîmenên koçberiyê
 Li ber singa dayîka dayîkan

Di sala 1977'an de li gundê Hemzebegê yê girêdayî bajarê Dêrika Hemko ji dayîk bûye. xwendina xwe ya seretayî li gund, ya navîn û amadeyî jî li dibistanên bajarê Dêrikê diqedîne.

ÇEMÊ XEMAN

Ji çavan dipijiqî axîn
 Dema navê xizaniyê dihate
 Ser ziman
 Li pey me dibarîn qêrîna
 Zarokên pêxwas û birçî
 Li nava tirafa kavişên
 Xatir ji ciwaniya demsalan
 dixwestin
 Bi liştokên kolan û koçe
 Ji xewa mirinê şiyar dikirin
 Bisk û zulfên razayî
 Li ber singa dayîkan dinaliyan
 şanoya li ser diwarên mirinê
 Kefênê tariyê diçirand
 Wê biskê dil xwe tavêt
 Bê qeyd û bê bend
 Di kevala şev û rojê de
 Hilala keştiya nûh careke din
 Dixwest tofana xezabê li ba-
 bike

NAMEYEK

Li nava rêzikên heştên ker û lal
 Şîn hatibû toven peyvên te
 Her tîpek nasnameyeke
 bêhempa
 Li ser lénûsa deryaya gerdûnê
 digerland
 Pênûsê li ber xwe kiribû kenê
 rûyê helbestan
 Bi helpirka bilbil û şalûlan
 Bîraninan mişt dida mijankên
 çavên razayî
 Xizemên ser xemla rewan
 Digirtin sema û şahî
 Dil meşt mabû û li ciwaniyê
 bibû mêvan
 Nêrgiz û sosinan silavên kar-

xezalan dihûnandin
 Pirpirîkan rîşikê tîrêjên rojê
 dixemilandin
 Xewê dixwest xendeyan
 birevîne
 Bênavber li deriyê serpêhatiyan
 dixişt
 Lê dema çav bi çavan diketin
 Cenga heşt û awiran dibû
 Gulîştana ferîşteyên bihuştê
 Li ser ezmanê çirokên
 Xewnên bêdawî

YADÎGARÎ

Bilind dibû dengê çemê Xabûr
 Dema min diqulibandin rojên
 kevin û nû
 Li ber xwe dibir keştiyek ji
 tevnê bayê
 Tayê desmala ezmanan vedire-
 şiya
 Dema rojê çav bi pêlûyan dini-
 xumandin
 Destên xizaniyê dimane şiyar
 Simbilên rewan govend dige-
 randin
 Seqema demên har derbasdiki-
 rin
 Seriyê tijî dima birçî
 Peyiza razayî di nava xembariyê
 de
 Hêdî hêdî xatir dixwest
 Peşkên tematiyê xak gemar
 dikir
 Goriştanan deynê mirinê didan
 Her yekî derziyek rakiribû

Tim dixwaze ji kaniya çavên te
 Ava jiyane vewxe
 Dixwaze ji girava dilê te
 Bihûnîne evsaneyên welatekî
 bê sînor

DAYÊ

Ji dîtina te bûme landika hêvî û
 hebûnê
 Bûme xunava ronahiya ser
 xemla
 Nêrgiz û lîlozan
 Bûme çiyayekî çavê xwe bi
 keskesorê
 Dişû û vedike
 Dengê te dibû oqyanos
 Û cihan hambêz dikir
 Ji dîtinekî dipişkivî gelek dîtin
 Li te digeriya bi çar çavan
 Bi dilê ji bona te lêdida
 Berî çav awirên xwe bibînin

**Elî roj, Gelek hel-
 best, gotar, bîranîn
 û serpêhatiyên xwe
 nivîsandine. Berhemên wî
 di gelek malper, kovar û
 rojnameyan de hatine we-
 şandin.**

ROJÊN BÊ SÎBER

Dema şev dibariya ser rê û
 rêçikan
 Wênayê stêrkan li ser mijankan
 diçirîsî
 Dîtinekî xwe berdida ser bejnê
 Her gavekî divexwar sed jan

Pêşengeh dima dîmenên ser
 birîna kulbûyî
 Qêrîna zarokan ji nava agirê sar
 Kezeba dayîkan parçedikir
 Wê demê diketim ser şopê
 Bi pêlûyên zanişt hambêz dike
 Li ber dengê dahola cenga
 Demjimêr serxwêş dikirin

DEMJIMÊRÊN WENDA

Her gav dema tiliyên min
 Diketin ser rûyê şevê
 Dimame bê cî û war
 Weke dengê bê vege
 Di gera bédengiyê de noq dibe
 Diketim ber serê xwe
 Weke bayekî nivkuştî
 Ji şerekî binkeftî dizivire
 Yek caran dema hizirandin
 Ji lebata canê min bajarên wen-
 da ava dikir
 Weke gorîstaneke axa xwe
 dixwe
 Li ser roja direve pişt perda
 tariyê
 Ji pirsên bê bersiv matmayî
 dimam
 Xaçerêkên tevlihev dibin
 Li ser textê gavên çav li xewê
 dinêrin
 Û dewsa xwe ji bir dîkin
 Serxwêş çep û rastê xwe
 Berdaye ber rehma xeyalan
 Naxwazim çavên xwe vekim
 Da nebinim raştiya raşteqîn û
 xewnan
 Çolîştana bi dîtina golên avê



Kerwanê gelawêjê nîgebanîya
 Refên lehiyên girseyan dikir
 Ji lebata canê bê laş û giyan
 Meydana cenga zixur û pêlan
 Peykerê xaka kevnar
 Gurzê derdê kalekî ber dergehê
 salan
 Ziman dikire volqana keser û
 hizran
 Bê şûn dikir ciwaniya çav spî
 Weke keştiya serxwêş û wenda
 Ji pêlan dipirse riya hedayetê
 Ser çeperê çar welatan
 Berê min li xeta dîr û dirêj
 TENYA
 Ber bi te ve dihelim
 Weke xunava radimûse demê
 şefeqê
 Weke axa diafirîne tovê
 zindeweriyê
 Bi zulf û biskên bûka baranê
 Gera deştara deştanan
 Dikşîne ji singa teşiya xeyalan
 Dixwaze dilê te hambêz bike
 Berî ku xatir bixwaze
 TENYA
 Gava ku ez sipartim axa pîroz
 Rondikan nebarînin ser gora
 min
 Li ber serê min
 Bi senfoniya dengê zarokan
 Û bi kenê awirên çavên Tenya
 Govenda heştan bigerînin

Tiliyên şewitî ji hûnandina
 Keziyên azadiyê
 Goştê bêjeyên zimanê gunch-
 karan
 Bi diranên jana dîmenên
 tolhildanê
 Roj bi roj tarûmar dibe
 Pêlên azadiyê sermeşt dixwazin
 Di nava pêlû û bijankan de
 avjenî bikin

**Elî Roj bi zimanekî
 pak û sade, qehremaniya
 goriyên welêt û bîranînên
 cihêreng di malikên hel-
 besta xwe de bi hoştayî
 dilûsîne.**

Refên çivîkên ezmanên darîsta-
 nan
 Ser bejna narîn û dilsozan
 dihejîne
 Li ber lîlava awazê dildaran
 Ser kevala welatê dilbirîn
 Çemê darîstanên buhara
 diherikî
 Ji xemla Xanê, Nêrgiz û
 Hêlînan
 Diherikî giyana gelemperiya
 Kurdiştanê
 Vegotin bi qetran dinuqutîn ser
 ziman
 Raştî bê çek diman lê tehlûn
 Xezeba lehiya tofanê
 Mejiyê mirovan dixwar
 Bê navber Dixwest
 Singa gund û bajaran daxbide


Bi wêjeya kurdî ve mijûl dibe û dixebite. Her wiha di karê ragihandinê de cihê xwe digire. Sê berhemên wî yên helbestan, ji wan du bi zimanê erebî û yek jî bi zimanê kurdî li derveyî Rojava hatine çapkirin.

JANA PEYVAN

Li ser nivînen razayî
 Bi cil û bergên tazî
 Dinixumand pîneyên lal
 Li ber çip çipa barana kor
 Nema êdî gul didim galegala
 Demên serxwêş û ker
 Bi çavên ku xwe nabîne
 Bi tirafa pênc hezar saliya
 rizyayî
 Pêşbirka mirin û jiyane
 deştêpedike
 Ser qapana bazirganên xwefiroş
 Ji pariyê di kulîna tarî de
 Dipirsim ma heya kengî dê
 Siya şûrê dagirkeran ser
 dergûşa me be
 Û guleyên bê nav û nişan
 Gerdena welatê min biçirînin

TENYA

Dilop dilop kenê çavê zarokan
 Diherikî ji pêşîra dayîkan
 Av dida baxçeyê hesreta heya-
 man
 Ji xewnên bê tirs û xof
 Bi min re dimeşiyar şîn û şahî
 Ji min dipirsîn bi kûve dice
 Şev û roj li min digeriyan



Lê şûjin li ber ronahiyê winda
 dibû
 Tev zar û zêçan
 Şemendefera jiyane digerlandin
 Berê refê qulingan dikete
 Kevana hîlala zêrîn
 Yadîgariya dayîk û bavay
 Dima kenê ser lêvan
 Rêzikin rûpelên dirokê
 Hêviyên nû gihiştî berhev dikirin

DAYÊ

Min tu dîtî berî ku ez xwe
 bibînim
 Wê çaxê ji xwe direviyam
 Min nedixwest tu min bibînî
 Lê dema te ez dîtîm
 Bûme dengêkî bê dawî
 Naxwaze ji ezman were xwar
 Bûme avek û herikim hinavê
 axê
 Bûme hinaseyekî gerim û sar
 Ji agir germtir û ji cemedê sartir
 Kenê teyê diherikî ser dem
 Demsala buharê bi ser min de
 tanî
 Dibûme tifalekî li ber pêşîra
 şahiyar

Berû min dihat bi yek car
 Temenê hebûnê dibû rojek
 Mehşerê meydan dixwand
 Ji dengê Adem û Hewa
 Ji tovê jiyane sêvek şînbû
 Dibû gunchê zayîna insan
 Ji herdû zayîndeyan ziriyet
 Li ber xezeba xwedayan diket
 Ax dibû qurbana aqilê sivik
 Rê dimane benda siwarê rojê
 Ji her nîşekî dima nav û nişan
 Çiya, bajar û darîstanê mirovan
 Tev bûbûn qûtê qedereke winda
 Ji ola evdalê olan
 Sûrê ezman diherifî ser gonê
 mirovan
 Dida ber xwe her bêjin û lebat
 Jê çêbûn mirîd, rênçber û bin-
 dest
 Çav tarî mij, moran û dewran
 Li hev digincilî girêka kor û
 falbaz
 Ji rîsta çarçefa tarî û xapînok
 Kesek jê re nedibû ewle û
 pêşevan
 Her yekî wek gurê birçî
 Ji xwîna xwe divexwar serdem
 û dirok

meşt dibe
 Lê tim û tim
 Di berbangê her dawiyekî de
 Bişkivînekî nû li dar e
 Bi dengê av, ax û hêviyan
 Ji nû ve afirandin diniqute ser
 lêvên axê
 Lebat xwe dighîne laşê bê
 giyan
 Rojên bi serwest xwêş kelamin
 Digerin nagerin bê hedarin
 Li bin siya sermediyê
 Mirin her tim dibe
 Serdestê kêliyeke jiyane
 Ser temenê demjimêrîn wenda
 Lê xweza dimîne rehma
 hêviyan
 Û sermeşt dibe deştêpêka hebûnê

Kurdî Xweş e

Agirbest	هذنة حرب
Derengmayî	متأخر
Pêkan	ممکن_مناح
Bala	مرتفع_عالی
Malik	بيت الشعر
Mamik	حذورة
Pêkenok	نکته
Qevd	باقة
Çêrgeh	مرعی
Rewrewk	سراب

Gotinên Pêşyan

Hevalê rêwiyan nan e
Dîn û serxweş yek in
Ziman kilîta dilan e
Ra li her tiştî dibe lê li mirinê nabe
Karê biçûk mezin meke

Bi dûranî, bi şêranî
Av diçe avahiyê
Mar ji serê xwe tê kuştin
Kul li mirovê baş digere
Deştê vala deng jê nayê

Pirsname

-Helbestvan Emerê Lalê di kijan salê de koça dawî kir?
-Yekem kurteçûka Kurdî ya nûjen, kê nivîsandiye?

Bersiva Pirsên Çûyî

-Şikefta Şanîdar e
-Di sala 1925'an de bû

Mamik

-Her roj diçe dibistanê, lê tiştêkî nizane?
-Tu çi qasî bikişîni xelas nabe, çi ye?

Bersiva Mamikên Çûyî

-Dûvpişk e
-Gûza Hindê ye (Coz El-hind)

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1									
2									
3									
4									
5									
6									
7									
8									
9									

Sitûnî

1_Fitlandin_Pişk vajî
2_Nûker bi Turkî_Aramî
3_Torîk_Ade belavkirî
4_Eli_belavkirî_A+s
belavkirî_Benê zirav
5_Vir+un
6_Du_tîpên_wekhev_r+r+g+ê+h+b_belavkirî
7_Du_tîpên_wekhev_Medrek_belavkirî
8_Huner_belavkirî
9_Du_tîpên_wekhev_Dan_belavkirî

Asoyî

1_Xwedî 1_Xwedî bawerî û îman
2_Lawir_Heywan_Deştvekirî
3_Bavê pêximber Silêman
4_Dijî_bir_Navê Melayê Cizîrî
5_Cihê kar
6_Ders_belavkirî
7_Reş_belavkirî
8_Bavpîrê Turkan
9_Deştanber

Amadekirina Xaçepirsê: Îsa Bavê Siwar

Bêkarî û Bêhnvedanên Domdar û Dirêj... Çi Bi Mirovan Dikin?

Di dema îroyîn de û li gelek deverên cihanê, nemaze li Rojhilata Navîn asta bêkarî û betaliyê her ber bi zêdebûnê ve ye. Bê guman kesên bêkar jî de di bêhnvedaneke domdar de bê liv û qelaq bimînin, gelo ev bêhnvedan û karnekirina dûr û dirêj dê bandoreke wê ya neyînî li ser tendurîstiya mirovan hebe yan na?
Birek ji lêkolînerên tendurîstî gihane encamêkê ku bêhnvedanên dirêj û bêkarî, bandoreke wê ya neyînî li ser tendurîstiya beden û hişê mirovan heye.
Li gorî zanyarên Biritani "Bêhnvedan û betlaneyên dirêj û domdar, û xwedirêjkirina herdemî, dibe ku nexweşiyên metirsîdar ji xwediyê xwe re bîne, wekî mirina zûdem; ji ber ku bazûyên mirovan sist dibin û rêjeya bezî di laş de pir dibe."
Ji aliyê xwe ve zanyarên Zanîngeha Irlengî a Elmanî tekez kir ku di bêhnvedanên dirêj de çalakiya mejî kêm dibe, û de karînen têgihiştinê jî li nik mirov pûç bibin.
Her wiha zanyarên Elmanî bal kişand ser wê yekê ku razana dirêj(Ku zêdetir ji 9 demjimêran) bandoreke neyînî li temamî tendurîstiya mirovî dike.

Sitêname 2

Çi qasî em li diroka hunera kurdî bikolin, em ê bêhtir hunermend û dengbêjen jin û mêrbinasin, ew in ên ku folklor û kultora Kurdî vejandine, û rupelên nû li diroka huner û çanda kurdî zêde kirine.

Elmas Xan:

Navê bavê wê Mihemed e, û dêya wê Asya ye. Di sala 1894'ê de li gundê "Xargulê" ji dayik bûye û li "Cizîra Botan" jiyaye
Di deştpeka sedsala biştan de, û di dema Cenga Cihanê ya Yekemîn de malbata wê ji bakurê Kurdiştanê direvin û berê xwe didin başûrê kurdiştanê, û li bajarê Zaxo bi cih dibin.
Dengê Elmas pir xweş û nazik bû, tevî rewşa jinan a dijwar di wê demê de, lê biryar dide ku ew derbasî hola huner û dengbêjiyê bibe.
Berê xwe dide bajarê Mûsilê û li wir çend sitranan tomar dike, piştê diçe paytexta Îraqê Bexda, li wir pêvajoyeke nû ji huner û mûzîka kurdî û ji jiyana xwe re dişopîne.
Bi diplomasiyekî Ingilîzî re şû dike, û çend salan bi evîni û xweşî bi hev dî re dimînin,

hevjîniya wan berdewam nake, ji ber ku hevjinê wê diçe welatê xwe, û Elmas biryar dide ku ew li welat bimîne, li ser xaka bav û bapîran.

Hevjînê wê bi rêzdarî biryara wê dixwîne, û hemî arzî, zêr û zîvan jê re dihêle.

Elmas xaniyekî mezin ava dike, ew xanî dibe didargeha hunermend, dengbêj, mûzîkjen, helbestvan û nivîskarên Kurd, û ji hemî aliyên ve arîkariyê bi wan re dike heta ku dibin navdar û xwedî ked û xebat,

nemaze ku wê di sala 1945'an de di beşê Kurdî de li Radoya Bexdayê programeke taybet pêşkêş dikir, û derfet dida wan hunermendan ku ew berhemên xwe tomar bikin.
Dibêjin piştê ew bi "Hacî Evdê Îsmayîlî" re şû dike, û bi arîkariya wî pir sitranên folklorî û gerelî dide hunermendan, û sitranên dane wan ev in:
(Qumrîkê, Lê lê Êmo, Xiftano, Dotmamê, Hey Nêrgîz, Riha-na Min, Hatim Beşa Belekê, Gulşîni û Lê Lê Kinê)
Saya wê jina merd û jîr li ser çand û kultûrê Kurdî heye û mezin e.
Di sala 1957'an de dev ji

Elmas Xan



Narin Omer

dengbêjiyê berdide, lê arîkariya ,dan û merdbûna wê berdewan dimîne.

Hajayî gotinê ye ku ew keça mamê Meryem Xan e, û hin dibêjin ew meta "metik" a wê ye. Dawiya wê:

Mixabin piştî ku pîrbûniyê neperûşkên xwe di temenê wê de zêde kirin, û êş û janan ew dorpeç kir; hemî mêvan, doşt hevalên wê xwe jê dîrê dikin, û piştê xwe didinê wekî ku wan Elmas yek rojê jî nedîtîbin û vê tiştê rewşa wê zortir û nexweştir kir.

Di Kanûna Didwan a sala 1974'an diçe li ser dilovaniya Xwedê, berhem, kar û xebata xwe dihêle navnişana dana xwe ya bêhempa.

Silo û Hebikên Serêşê

Jina wî jê pirsî û got:

Silo te hebika xwe xwar, ma ev çi ta ye te pê ve girê daye û bi deşt xwe ve hêlaye.

Silo got:

Min ta bi hebikê ve girê daye, dema ku serê min rehet bû ez ê car dî hebika xwe vegehinim.



Serpêhatî



Bersiva Xaçepirsê Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	B	A	W	E	R	M	E	N	D
2	A	L		E	R	M	E	N	A
3	T	Î	Ş						D
4	M	K	A		N	A	V	A	G
5	A	A		N	A	M	A	Z	E
6	N	R	E	N	Î		Ş	A	H
7			R	A	Y	M	A	R	
8	Q	A	Û		T	A	N	Î	Z
9	Q	A	M	I	Ş	L	O		Z

Mirovê Ehmeq

Dibêjin mirovek ket ber halê xerab ku bimre, bang li lawê xwe kir. Law hat li ber serê wî rûnişt.

Mêrik got: Lawo! Eger ez mirim sed mecîdî xêra min bide yekî ehmeq. Mêrik mir.

Piştî mirina wî lawê wî ra-hîşt sed Mecîdî û bi nav gunda ket.

Hat gundekî, dît ku def û zirne, reqs û govend e qiyamet rabûye. Lawik dît ku yek bermeqlûb li kerekê siwar kirine, terya kerê dane deşt û yek serê kerê dikşîne û zarok li dû li çepkan dixin. Yekî din li ser doşekê rûniştiye û çekine sipehî lê ne û pala xwe daye balîfan.

Lawik ji yekî pirsî: Ev çi mûnasebe ye?.

Jê re got:

Ev ê bermeqlûb li kerê siwar kirine, keyê(Axa) kevin e û evê li ser doşekê rûniştiye yê nuh e.

Lawik got:

Ev çi adet e?

Mêrik got:

Her ji du salan em keyakî radikin. Piştî du salan em bermeqlûb li kerê siwar dikin.

Lawik got:

Ma piştî du salan hûn ê li evê ser doşekê wilo lê bikişin?

Mêrik got:

Ev li pêşiya wî ye jî.

Hema lawik rabû û kîsê Mecîdiyan li ber danî.

Yê li ser doşekê got:

Ev çi ye?

Lawik got:

Ev xêra bavê min e wextê ku mir wesyetî min kir û got: Eger ez mirim tê sed Mecîdî xêra min bidî yekî ehmeq, lê bi Xwedê min ji te ehmeqtir nedî va tu bi çavê xwe dibînî bê çi dikin ji keyê kevin mane piştî du salan wê wilo li serê te jî bikişin!!!